TÊKOŞER

hêjmar:21

sal:1983

REVUE TRIMESTRIELLE

DRIEMAANDELIJKS BLAD

www.kurdi.org

TÊKOŞER

TÊDAYÎ (İÇİNDEKİLER)

Rûpel (Sayfa)	Nivîsar (Konu)
2	Cunta Faşîst Negiheşt Armanca Xwe.
4	Bi Histirên Çavan Tên Nivîsîn Helbestên Me.(Helbest) Sekreterimiz Göz Altinda.
5	Çîrokek Li Ser LENÎN.
6	Dîroka Tarî Rohn Dikin Bi Bahwerîya Xwe.(Helbest)
7	Faşîst Cunta Kürdistan'da Yenildi.
9	Min Ev Xweşîtî Navê.(Helbest) Azadî.(Helbest)
10	Belçika'da Skandal.
11	Ben Ve Mapusluğum.(Şiir) Jîn.(Helbest)
12	Yekbuyinê Li Ser Kurdistan.
14	Têkoşer'den Haberler.
16	Xebata Me.
18	Nameyên Xwendevanan. Pirsekî Bi Lez (acîl) ji Wezîrê Kerên Derve ê Belçîka re.
22	BANG.
23	Xaçe Rêzik.
24	Du Name Ji Dr. Ismet Şerîf Wanly Ji Bo ONU.

TEKOŞER: Kovara Têkoşer Yekîtîya Karker û Xwendekarên Kurd li Belçîka

TEKOŞER: Belçika'daki Kürt İşçi ve Öğrenciler Birliği

Het Blad van Koerdische Arbeiders en Studentengemeenschap in België

Berpirsîyar/Sorumlusu Verantwoordelijk Uitg: *M.NEZÎH YALÇIN*

Navnîşan/Adres: TEKOŞER - B.P.33 1730 Zellik - BELGIQUE

Bûha/Fiyatı/Prijs: 40 Bfr, 2 DM, 6 FFR

Şerten Abonetîye: 480 Bfr

Hejmara Bank Bank(a) Hesap No: TEKOŞER 426-3144071-85 *Kredietbank - Belgique*

CUNTA FAŞIST NEGIHEŞT ARMANCA XWE

Cunta faşîst, di 26ê heyva gulanê de bi hêzeke zêdetir ji 15 000 kesan êrîşek bir ser Kurdistana Irakê. Amanca vê êrîşê, perçiqandina hêzên welatparêz bû, ku ji bo mafên xwe yên demokratîk û netewî hember sazûmana zordest şer dikirin.
Di tarîxa 28ê gulanê de jî, dîsa li Kurdistana Bakur, di bajarên Kars û Erzurumê de tedrîbên rêxistina hêzên emperyalîst NATO bi navê "Adventure Express 83" çê dibin. Di van tedrîban de leşkerê Emerîka (USA), Elmanya Rojava, Italya û Belçîka, bê goman Tirkîye beşdar dibin.
Wek tê zanîn, berî vê êrîşê û tedrîban di tarîxa 24ê gulanê de mehkema cunta yê birayara 35 îdam, 28 cezayê girtinê heta sax in û 333 kes jî ji 3 sal heta 36 sala hikmê girtinê ji bo Kurdan di girtîgeha Dîyarbekrê de da. Li cem van tiştan, her roj, bi hezaran kes di bin şertên ne xweş de her rengê zorbetîyê dibînin. Ji lêdana fîzîkî ta ta'dayîya psîkolojîk di girtîgehan de li ser girtîyan, li derveyê girtîgehan jî li ser gel bi xwe dibe.
Ew girtîyên ku ji bo azadîyê têkoşîn kirine, di bin gomana kuştinê de dijîn. Cunta dixwaze wan kesan hunda bike. Girtîyên ku paş demekê derdikevin derve, dibe xwedîyê "azadîya" xwe li qasî hezar problêmî dibe. Ji alîyê fîzîk û psîkolojîk, ew kes pirr êşîya ye. Zehmetîyan dibîne ku xwe dîsa bixe nava civaka normal de. Di alîyê din de jî polîsên rejîmê wan kesan rihet nahêlin. Ango, weka ku me di fîlmê Yilmaz Güney, "YOL" de dît, jîyana li Tirkîyê ne bes di girtîgehan de girtî ye û di zîndanê de ye, lê herweha, ji derve jî bi tiştekî giştî jîyan êsîr e, di zîndanê de ye. Ev jîyana di zîndanê de, bi pirranî li Kurdistanê heye.

Ev her sê bûyer di nava yek heftê de, ne tiştekî biçûk û texmînî ne. Wan dixwest ku planekî weha bikar bînin ku gelê Kurd bitirse. Biryara îdama 35 ke-

www.arsivakurd.org

san, bi salan cezayê girtîgehê û h.w.d. êrîşên ji sînorên Mîsakî Millî zêdetir û tedrîbên NATO bi sedemên çav tirsandinê û îmhakirinê hatin bi kar anîn. Hêzên zordest weha dizanin ku bi van kirinên xwe yên wehş merivên têkoşer, gel bi xwe, ditirse û dikeve bin heyecanê de.
Ew bi vê yekê xwe bi tenê dixapînin. Eger heyecan û tirs bikevê ser dilê gel de, şerkerên azadîyê de jî, li cem vê tirs û heyecanê, ev gel û şerker hê zêdetir bi kîn dibin.
Li ser van her sê bûyeran û hemberên dewletên mêtingehkar û hêzên emperyalîst di tarîxa 4ê hezîranê de sê rêxistinan (TÊKOŞER, Partîya Demokratîk a Gelê Kurdistan-Irak û KSSE-liqê Belçîka) li ber balyozxana Tirkîyê li hev gihan hev û ev zordarîya li ser gelê Kurd protesto kirin. Ji xeynî van her sê rêxistinan û Kurdên serbixwe pirr kesên Belçîkî jî beşdarîya vê protesto yê kirin. Ji parlementoya Belçîka jî senator J. HUMBLET û Willy Kuijpers beşdar bûn û cunta faşîst, zorbeyên Irakê û NATO protesto kirin. Van her du parlementêran di parlemento de jî ev mesele anîn peyvê û resolusyon dan hikumeta Belçîka.

Vê êrîşa leşkerê Tirk (di hemberê azadîxwazên Kurd de ku li serê çîyan in, şoreşgêrên ku ne Kurd in lê lê Kurdistanê di nava şoreşê de xwe diparastin û gelê Kurd bi xwe) carek din pêşan me da ku dewletên mêtingehkar di roja tengîyê de dibezin arîkarina hev û din. Cunta faşîsta Tirkîyê ditirse û ji ber vê tirsê ye ku weha zorbetîyê dike.
Ev zordestî, li ser gelê Kurd û proleterya Tirk, Ereb, Faris, Ermenî û komikên din heta hetayê nikare dom bike. Ev gel wê rojekê mala zorê xira bikin.
Sazumana Irakê, ku ji salan û vir de hemî wehşîtîyan li ser van gelan dike, ji hev felişî ye. Saddam Huseyin zane ku şoreşgêrên Kurd xwe di nava çîyan de baş organîze kirine. Leşkerê Irakê di cephê de ye li hemberê Iranê. Ji ber vê yekê jî ew di tengîyê de ne. Di bin van şertan de arîkarina cunta Tirkîyê ne xirab bû ji Saddam Huseyin re.
Êrîşa leşkerê Tirk, pirr xesar da gelê Kurd li Kurdistana Irakê û gundên li ser sînorên di nav her du dewletan de ku ji alîyê van dewletan bi zorê hatine danîn li beşê Tirkîyê. Leşkerê Faşîst gund şewitandin, zarok, jin, pîr girtin û kuştin. Bi balafiran Kurdistan bombe kirin.
Her du dewlet baş dizanin Kurd li parçekî ji yê Kurdistan bi hêz bibin, ji dewletên din re jî tehluke ne. Bi vê yekê cunta Tirkîyê ji tirsa xwe bezî arîkarina zorbeyên Irakê.

Lê tîra leşkerê Tirkîyê li latê ket. Pêşmergen di çîyan de pirr zerer da leşkerê Tirkîyê. Netewekî ku ji bo mafê xwe yên demokratîk û netewî şer dike zû bi zû naşike.
Paş ku generalên Tirk dîtin ku çîyayên Kurdan ji leşkerê wan re dibin mextel, nexweşxanên seyar şandin ber sînor. Ji ber ku cih di nexweşxanên normal de ji birîndar û kuştîyên wan re nemabûn. Cunta faşîst jî, xwedî grêv, ev nexweşxanên seyar "ji bo gel" dibirin. Lê gel pirr baş dizane ku ew sazumana ku dixwaze wî gelî ji ser rûyê rdê rake, ti nexweşxanan jê re nabe. Ev 60 sal heye ku ev sazumana zorbe ava bû ye û ti tişt ji wî gelî re nekirî ye, îro radibe nexweşxanan, di vê rewşê de jê re bibe!? Cunta bes xwe dixapîne.
Gelê me jî vê yekê baş dizane.
Tedrîbên NATO jî di vê heftîyê de dibin. Di vê rewşê de NATO li gora planên di navbera wan de hatî ye grêdan, gereke hazir be eger tiştekî giring bibe.Ew naxwazin paş Iran, Tirkîye jî ji destên wan derkevê.
Di vê navberê de li ser van bûyeran, rojname, radyo û televîzyonên Tirkîyê qala "serketina leşkerê Tirk di hemberê heydutan de" dikirin.Digotin ku ev êrîş "bê xwîn derbas bû", "gelê dar û dora mintiqê ji vê hereketê pirr memnun bû". Rastî li ti derî ne nivîsan din û ne gotin.
Rojname, radyo û televîzyonên Ewrupa jî pirr kêm bala xwe dan vê bûyerê. Ew çap li ser hin tiştên din radiwestin ku ji mesela Kurdan pirr kêmtir giring bû ji mesela Kurdan.
Kuştina hezaran Kurdên belengaz ku sucê wan bes xwestina mafê insanetîyê ye û ji ber vê yekê ji alîyê sê dewletên zorbe ku jînê li netewê Kurd dikin zîndan ji vê çapê re giring xuya nake. Lê dema bêhvila (pozê) merivekî Tirk li Ewrupa, yan jî li Tirkîyê bi xwîn bibe, yan jî

Dumahî li rûpelê 19. de ye.

Bi Histirên Çavan Tên Nivîsîn Helbestên Me

M. Emîn Bozarslan

Li girtîxanan
li girtîxanên teng û tarî
li pey derî û pêçikên hesinî
li pişt dîwarên bilind
di nav kêzik û mişkan da,
tê çandin tovê bêjeyê me
û dikemile dîroka me

Bi histiran
bi histirên çavan
bi histirên çavên zarûkan
ku dirijin li riya bavan
bavên li girtîxanan,
tên nivîsîn helbestên me
û dikemile dîroka me

Bi axînan
bi axînên jinên ciwan
bi axînên bûkên ter û teze
ku tên kişandin ji kûrana dilan
li riya malxoyan
malxoyên li girtîxanan,
tên raçandin çîrokên me
û dikemile dîroka me

Bi xwînê
bi xwîna xortan
bi xwîna keçên xama
bi xwîna pêşmergeyên qehreman
ku tê rêhtin li serê çîyan
li serê çîyayên Kurdistan,
tên çêkirin marş û xweşxwanên me
û dikemile dîroka me



Îlhama me
ne ji lêveên sor e
ne ji çavên kildayî ye
û ne jî ji dêmên gulî ye
Histirên çavan e
axînên dilan e
axîna xort û keçan e
kana îlhama me
sira li me
û perîya dilê me

11.09.'71
Girtîxana Eskerîyê li
bajarê Amed (Diyarbekir)

SEKRETERİMİZ

14 Temmuz 1983 tarihinde Brüksel'de bir Türk diplomatının öldürülmesi üzerine; aynı gün saat 17.00 sıralarında Belçika Gizli polisi ve Jandarması 2 üyemizin evine baskın yaparak arama yaptılar. Bir üyemiz evde olmadığı halde evi arama yapılarak: Kürtçe, Türkçe, Fransızca, Flamanca yazılı bazı belgeleri, dergileri, resim ve Avrupa'daki örgütlerin adreslerini alarak hiç bir tutanak yapılıp imzalatılmadan götürdüler.

Ertesi gün saat 10,00 da Jandarmada 4 saat boyunca ifadesi alınan dernek sekreterimiz, olayla hiç bir bağlantımızın olmadığını ıspatlaması üzerine serbest bırakıldı. El konulan belgeler defalarca başvurulmasına rağmen henüs üyemize iade edilmemiştir.

Bu olaylar üzerine Têkoşer Fransızca, Flamanca bir Basın açıklaması yaparak arkadaşlarımızın sorguya çekilmesini kınadı. Olay anlatıldıktan sonra kısaca ; 16-17 Temmuz tarihli Le Soir gazetesinde öldürülen Türk diplomatı üzerine yayınladığı makalede: " Türk rejimine karşı Türk, Kürt ve Ermeni'

GÖZ ALTINDA

lerin bir koalisyon yaparak gizli bir birlik oluşturduklarını yayınlamıştı." Aynı tarihlerde Türk gazeteleride aynı makaleyi tamam layan şeyler yazdılar.

Têkoşer yaptığı basın açıklamasında: Bütün enerjimizle Faşist Askeri Cunta'ya karşı olmamıza rağmen, bu olayla ilgili uzaktan ve yakından vede herhangi bir terörist örgütlede alakamız yoktur dedi. Yapılan basın açıklaması Le Soir gazetesine tekzip mahiyetinde gönderildi.

Demokrasiyle idare edilen bir ülke olan Belçika'da hiç bir hakkı olmadan Belçika polisinin bu konuyla ilgili olarak üyelerimizi sorguya çekmeleri ve hiçbir tutanak tutmadan bazı belgelere el koymasını hayretle karşılıyoruz.

Le Soir ve Türk gazeteleri Faşist Türk Cuntasına karşı olan tüm örgütleri aynı kefeye koyuyor. Bu olaylardan yararlanan Fa-

dumahî li rûpelê 18. de ye.

www.arsivakurdi.org

n. k. krupskaya

Wergervan : Derwêş FERHO

çîrokek li ser LENÎN

Vasya, biçukek ji milyonan e li Yekîtîya Sovyet ku hazirîya salên pêş xwe dike. Çavên wê li ser tabloya bi dîwêr ve daleqandî, ji bavê xwe dipirse:
-Bavo, tu ji bo min li ser vê tabloyê na axivî ?
-Belê Vasya ! Lê, tu zanî ev merivê di tabloyê de kî ye ?
-Çawa nizanim ? Ez dizanim : L e n î n !
-Vladimir Ilîç Lenîn e ew... Serokê me yê xoşewîst. Bi hise, dibêjim...
Di heyamekê de em karker, li ser vê axê di bin şertên pirr giran de bûn. Şertên karkirinê ne ku meriv îdare bike bûn. Ji bo çend quruşan, me şev û roj kar dikir.
Li karxana ku min kar dikir, bi sedan karker di eynî rewşê de bûn...
Patronê karxanê jî hebû: Jê re digotin Danîlov... Wî qet ne kar û ne tenezûlî kar dikir. Lê jîyana wî wek ya melîkan bû. Ufff, him çi jîyan...
Başe, wî evqas mal ji ku anîbû ? Xuya ye : em şev û roj, tev birçîbûna xwe didan ber kar û em talan dikirin...
Karxane, mekînên li karxanê, mal û dirav giş yên wî bûn. Yên me jî, ji xeynî destên me yên birîndar tiştek nebû. Ti çare nebûn ji xeynî ku em kar bikin û wî hê bêhtir dolemend bikin.
Ne bes li karxana Danîlov, lê li hemî karxanan rewşa karkeran wisa bû...
Di wan rojan de rewşa gundîyan jî wek ya me bû. Hemî erd di destên axa û began de bû. Gundî jî bi şev û roj ji wan axa û began re kar dikirin.
Dema gundî ji rezaletê dinalîn, destekî axan di rûn de destê din di nav hingiv de bû...
Di nava axa û kapîtalîstan de, yanî dolemendan de mû ne dibihurt. Wan tim pişta hev digirt. Di serê wan de jî zengî-

dumahî li rûpelê 6. de ye.

www.arsivakurd.org

nê axan, Çarê Rusan hebû. Ji ber ku menfaetên wan yekbûn, di hemeberê gel de her tim alîyê axan û kapîtalîstan digirt. Qanûnên alîgirên wan didan derxistin, ji bo ku karker û gundî hê bêhtir bên talankirin tiştên jê dihatin dikir.
Di wê demê de dost û hevalbendê karkeran Vladimir Ilîç Lenîn derket meydanê. Wî bahwer dikir ku ew sîstêma xerabe wê bê guhertin. Wî dixwest ku gel bikeve rewşeke baş de. Ji bo mafên karkeran jî kete nava şer.
Merivên ku xwe dabûne ber mafên karkeran dest bi komcivînan kirin li dora Lenîn. Jimara wan, her roja diçû zêdetir dibû. Partîya karkeran ya rêzanî -Partîya Komunîst- roj bi roj bi hêztir dibû. Partîyê dît ku, kes memikê nade zarokên ku nagirîn, bê şr jî ti maf nayên wergirtin. Karkerên dewletên din jî gihiştine vê biryarê.
Bê karkeran çiqasî hez ji Lenîn dikir, kapîtalîst û axan jî hewqasî jê ditirsîyan. Çendek paş de, Lenîn ji alîyê polîs hate girtin û wan ew avêtin zîndanê. Ji tirsa xwe ew şîyandin ta Sîbîrya. Êdê wan digo qey heta hetayê jê xelas bûn.
Lê belê Lenîn, ji bo şerê xwe berdewam bike, bazda derê welêt. Li Ewrupa bi salan, weke aware (xew sipartîyê sîyasî) ma. Li wê xerîbîyê jî, bi şev û roj bîr dikir û dinivîsî.
Wî dixwest rîya xebatê şanî çîna karkeran bike. Paş demekê, vegerîya welêt û rast û rê şerê karkeran îdare kir.
Dema ku şerê cîhanê dewam dikir, di sibata 1917 de karkeran û leşker bi hevra çarê zalim ji text anîn xwahr. Paş çend heyvan jî, di 7.11.1917 de zora kapîtalîst û axan birin. Dest danîn ser ax, erd û karxaneyên biçûk û mezin. Di cihê sîstêma talankirinê de dest bi avakirina sîstêma xwe kirin. Êdê biryara kar ne çar, ne dolemend û ne jî axan dida, lê rast û rê karker û gundîyan dida.
Lê ew hemî nuh bûn ji bo karker û gundîyan. Ji bo vê sazbûna vê sîstêma nuh, Lenîn û partîya wî rê pêşanî karkeran dikir, di vê rîya nuh de ji bo jîna xwe karker bi xwe ava bikin, arîkarina wan dikirin.
Ji bo vê yekê Lenîn, gereke pirr kar kiribane. Pirr pirs û mitale li ber hebûn. Nexweşîya wî roj bi roj girantir dibû.
Ji ber van şertên xebata giran, V. I. Lenîn di sala 1924 de çû dilovanîyê... Mirina Lenîn ku zû hat, em hemî karker pirr pirr xemgîn hiştin. Lê em ti carî şîretên wî ji serê xwe dernaxin. Me biryar da ye ku em şîretên wî bi cih bînin. Niha em hemî şertên jîn û kar ji nuh de ava dikin. Emê bi ser kevin !

Dîroka Tarî Rohn Dikin Bi Bahwerîya Xwe

Derwêş FERHO

Dîsa dixwazin birêjin
Mêtingehkarên hov
Xwîna zelal û delal
Dîsa dixwazin biherike
Xwîna şoreşgêran li ser axa Kurdistan.

Tarî bû dîroka gulistan
Paş Medya û Merwan
Kulîlka dîroka bi xwîn
Komara MEHABAD
Tarî ye jîn li me.

Îro, rojek din ji vê dîrokê
Weha zexel
Bê şerm
Bi kuştina sedan dilên ciwan
Di rîya serxwebûnê de.

Lê şik û gomanan nakin ew dil
Bahwerîya wan qewîn e
Di her gotin
Û çirîskên çavên wan de
Rohnîya azadîyê xwîya ye.

Ji destpêkê ta dawî
Dîtin tar û mar e dîroka tarî
Hatin zelal bikin
Zelal bikin jînê bi mêranî
Can bi can
Hilgirtin doza xwe
Ku bînin cih daxwazîyê
Di rîya pêşîyan de
Rakin meydanê mêrxasîya Yezdan Şêr
Bahwerîya Seyid Riza a qewîn.

Ewan wek keliha Dîyarbekrê
Hember dijmin rawestane
Bi dilekî şad

www.sivakurdi.org

FAŞİST CUNTA KÜRDİSTANDA YENİLDİ

Niçin bu başlık ?

Faşist Cunta işbaşına geldiği günden beri her istediğini direk hiçbir muhalefetle karşılaşmadan gerçekleştirdi. Gerçekleştirmeye dahada devam ediyor. Fakat kendilerini her şeyi yapmaya kudretli olduğunu ıspatlamaya çalışan Faşist Askeri Cunta ilk defa, sınırlarını aşarak Irak Kürdistanı'n da giriştiği harekâtla amacına ulaşamadı. Şişirdikleri balon söndü. Örgütlü Irak Kürdistanı ulusal kurtuluş güçleri karşısında güçsüz oldukları görüldü. Yaptıkları cürret kârlığı örtpas etmek için zavallı Kürt köylülerinin yaşlı, kadın, çocuklarını toplayarak hırslarını gidermeye çalıştılar.

Olayların içyüzü ve gelişimi: Kürdistan ı parçalayıp aralarında bölüşen sömürgeci 4 devlet (Türkiye, İran, Irak, Suriye) aralarındaki değişik rejim ve ideolojik düşünce farklılıklarına rağmen Kürt Ulusunun ezilmesi söz konusu olunca, onun ulusal kur tuluş mücadelesinin boyutlandığı her dönemde birleşebilmişlerdir. Aralarındaki antagonizmaya rağmen talan, sömürü ve baskıları nı ikili, üçlü, dörtlü ittifaklar halinde gerçekleştirmişlerdir. Aralarında değişik başlık ve adlar altında antlaşmalar imzala mışlardır. Her antlaşma ve görüşmede amaç ve sömürgeci devletler açısından baş mesele Kürt ulusunun varlığı ve onun mücadelesi,bu mücadeleyi nasıl ve hangi yöntemlerle daha uzun bir tarih dilimine erteleyebilecekleri sorunu olmuştur.

Irak Kürdistanı'nın mücadelesinin kurban edildiği CEZAYİR antlaşmasını tek taraflı Irak'ın bozması ; Kürt halkına yapılan yardımın durdurdulması karşısında İran'a bırakılan Basra Körfezi'ndeki bazı stratejik topraklar üzerinde hak iddia etmesi ve pişmanlık duyması üzerine başlayan İran-Irak savaşı yaklaşık 3 yılını doldurdu. Her iki tarafın büyük kayıpları olduğu gerçeği vede Humeyni ile Saddam Hüseyin rejimlerinin zayıf ladığı da ortadadır.Bölgeyi tehdit eden bu savaş aslında tüm bölge halklarının çıkarlarına karşıdır. Özellikle Kürt halkı'nın çıkan bu haksız savaşta zararları fazla olmuştur.

Irak,Kürt Ulusal Kurtuluş Güçleri'ni Humeyni'ye karşı savaş saflarına çekmek için çeşitli taktikler uyguladı. Otonomi hakları vaad edildi. Tüm girişim ve kandırmacı poli tikalarına rağmen Kürt halkını yanlarına çe kemeyeceklerini anlayan Saddam Hüseyin Rejimi ; 4 yıl önce savunma - işbirliği adı altında Türkiye ile imzaladıkları antlaşmaya dayanarak, Faşist Türk Cuntası'ndan direk Irak Kürdistanı'na müdahale talebinde bulun du.

Sınırlardaki gelişmelerden rahatsız olduklarını, YEKMALE (Türkiye Kürdistanı'nın Hakkari iline bağlı Çukurca'nın bir köyü) de 3 erin ölümü 2 subayın ağır yaralanması ve 8 köylünün kafasının kesilerek Tandıra atılmasıyla sonuçlanan olayları bahane ederek, böyle bir operasyona öteden beri hazır olduklarını ve aynı şeyi düşündüklerini bil diren Faşist Cunta, büyük bir gurur, umut, heyecanla, ataları Osmanlılardan kalma ününü, şanını cihana tekrar duyurmak için ulus lararası hareketleri dahi tarih sahnesinden silip yerlebir edebileceklerinin güvenini kendilerinde bulup : 4o bin kişilik bir kuveti çok illegal bir şekilde savaşa hazırla dı. Bolu Komando Tuğayı ile Kayseri Hava İndirme Tuğayı desteğinde tüm Diyarbakır 7. Kolordu Komutanlığına bağlı birliklerle Irak Kürdistanı'na karşı başlattığı saldırının 3. günü resmi açıklama yaptıkları görüldü. Savaş uçakları, tank, top ve helikop terler desteğindeki bu sldırı harekâtı ne yazık ki Türk Basını çok adice verdi.

Eşkiya kimdir?

Sınırlarını aşarak Irak Kürdistanı'na giren haydut sömürgeci faşist Türk Ordusu mu, yoksa kendisini savunmadan başka alternatifi olmayan, varlığı dahi inkar edilen mazlum bir ulusun ulusal kurtuluş güçleri mi?

Dünya basını, Türkiye basını gibi şovenist paşaların emrinde olan bir basın değildir. Türk basını büyük puntolarla "eşkiyalara gereken dersi verdik" diye dursun, dünya basını bu acıklı sernayoyu paşaların düşündüğü ve istediği gibi yazmadı.

www.arsivakurdi.org

Haydut ve eşkiyanın faşist Türk ordusu ve devleti olduğu ortaya çıkmakla beraber mahkum edilip bir şamar yediğini vurguladı. Bilinçli, demokrat olan tüm insanlık boyalı Türk basınına ve gazetecilerine acımalıdır doğrusu. Nedenine gelince, gazeteciler operasyonu izlemek üzere Cizre'ye (Türkiye Kürdistanı sınır kazası)na kadar gider. Dicle Nehri üzerinde bulunan ve yıllardan beri sömürgeci faşist cuntanın askerleri tarafından iki ucunda arama ve tarama yaptıkları Kennedy Köprüsü'ne gelirler. Gazetecilerin tüm makineleri, malzemelerine el konulup, kırılıp Dicle Nehri'ne atmışlardır. Bir tek gazeteci olayı açıklama cesaretinde bulunmadığı gibi, utanmazca "operasyondan görüntüler - Eşkiya kaçıyor, Türk Ordusu kovalıyor" başlıklı manşetler atmağa devam ettiler.

Bunlara gazeteci, basın mensubu demek basına sığmaz doğrusu. Ancak olsa olsa faşist sömürgeci cuntaya satılmış yalaklar olurlar. Yunanistan'da faşist albaylar cuntası'nın yıkılmasında emeği geçen gazetecileri hatırlayınca, Türk basın mensuplarına acımamak elde değil.

Kürt Ulusu'nu ve onun mücadelesini doğrudan hedef alan bu saldırı harekatı aslında faşist sömürgeci cuntaya karşı olan muhalefete hedef şaşırtmak için yapılan bir denemedir. Kürt halkını toplu yargılayan davalara ilişkin kararların peşpeşe çıkması, 35 Kürd'ün idama çarptırılması, NATO generallerinin Türkiye'yi ziyaretleri, ABD Genelkurmay Başkanı'nın Türkiye Kürdistanı'nda uygulanan çevik kuvvetler'in de katıldığı Macera Express - 83 tatbikatına bizzat katılması,Ege'de yapılan İlk Hedef-83 tatbikatının aynı sürece denkleştirilmesi tesadüfi değildir. NATO ve ABD'nin Ortadoğu'daki emelleri için planlanmış programlanmış bir seri operasyon, tatbikat ve denemelerdir. Bölgedeki bir değişmenin çıkarlarını zedeleyeceğini çok iyi bilmekte olan NATO ve ABD kesenin ağzını faşist cuntaya açıyor. Hava alanlarını modernleştirip modern savaş silahlarını yerleştiriyor. Sovyetler'e karşı Türkiye'yi bir maşa olarak istediği gibi kullanıyor.

Hakkari'nin Çukurca'dan Irak sınırlarına girip tüm Peşmerge'leri çembere alıp esir edecek güçte olduklarını düşünen faşist cunta'nın ordusu büyük bir direnişle karşılaştı. Kahraman Peşmerge'ler, paşaları ve ordusunu hüsrana uğrattı. Kürdistan dağlarının Kıbrıs'taki Beşparmak dağları olmadığını düşmana kanıtladı. Püskürtülen Türk askeri, Uludere'den Şırnak-Silopi üzeri Habur sınır köprüsünden geçerek Zaxo (Irak Kürdistanı'na) saldırdılar. Saldırgan Türk Ordusu, bu defa Kürt köylerini bombardıman edip harabeye çevirdi. Köylüleri, kadınları, çocukları, GMC'lere doldurup peşmergelerin yakalandığı haberini arlanmazca verdi.

Irak Kürdistanı Ulusal Kurtuluş güçlerinin kurtardıkları ve örgütlü bulundukları topraklara yaklaşma cesareti bulamayan faşist Türk ordusu hıncını zavallı köylülerden almaya çalıştı. Yenilgisini gizlemek için günlerce askerini Irak topraklarında tuttu. Savaş jetlerini alçaktan uçurtarak halka gözdağı vermeye çalıştı. 20 güne yakın bölgeye giriş çıkışlar yasaklandı. Sınır köyleri mecburi göçe zorlandı. Bölgede seyyar sahra hastaneleri kuruldu. Uçak ve helikopterleri yaralıları büyük hastanelere günlerce taşıdı. Kürdistan'dan aldığımız ve bir subayın itiraf ettiğine göre, bu harekatta Türkiye 500 askerini kaybederken, Peşmerge'lerden sadece 80 kişi hayatını kaybetmiştir. Sert bir kayaya çarptığını anlayan faşist cunta, bu defa Türkiye Kürdistanı'nda bulundurduğu askeri savaş güç ve aletleriyle Siirt'in Şırnak İlçesi'ne bağlı DERGÜL mevkiinde bir tatbikat yaparak halka gözdağı vermeğe çalıştı. Faşist cuntanın şefi Kenan Evren, bizzat bu tatbikata katılarak bu bölgedeki gelişmeleri yakından takip etmek için Hakkari'ye kadar gitti. Mardin, Şırnak ve Hakkari'de yaptığı konuşmalarda bölücüleri yoketmeğe kararlı olduklarını ve onlara göz açtırmayacaklarını, bölgede yaşayan halkın Selçuklular'dan önce buraya gelip yerleşmiş ilk Türk kavimleridir, diyecek cüretkarlıkta da en büyük şef olduğunu, Kürd halkının gözünün içine baka baka yalan söyleyecek kadar adileşti.

Faşit Cunta'nın bu emellerine, NATO'ya, ABD'ye, silahlanmaya karşı çıkmak bir insanlık görevidir. Enflasyonun dört nala gittiği, dış borçların milyarla bile ifade edilemediği, zamların günlük yaşamın bir parçası haline geldiği, işsizliğin hızla arttığı, üniversite kapılarının her yıl yüzbinlerce gence kapatıldığı, halkın çoktandır 1978 yılındaki satınalma gücünün altına düştüğü bu dönemde silahlanmaya ayrılan harcamaların halkın beslenme, giyim, barınma, sağlık, konut, bayındırlık, turizm, işsizliği giderme harcamalarının toplamından kat kat fazla olduğunu hepimiz biliyoruz. Bunlar yetmiyormuş gibi, tatbikatlar, operasyonlar... Peki bunca uygulama için harcanan bu paralar kimin cebinden çıkıyor? Kimin sağlığından, kimin emeğinden, alınterinden kesiliyor? Vergiler kimin sırtına yükleniyor? Evet, işçiye, emekçiye, köylüye; yurtsever Türkiye ve Türkiye Kürdistanı halklarının sırtına elbette...

Bunca çözülmesi gereken acil sorunlar varken komşu bir devletin sınırlarını aşarak maceralara girişmeyi, Türkiye'deki emekçi, demokrat köylülerin affetmeyeceğini umarız. Faşist askeri cuntanın teşhir olduğu günümüzde anti-faşist muhalefet saflarında yerlerini almalarını bekler, faşist cuntanın saldırgan ve halk düşmanı politikasını lanetlemelerini ve mahkum etmelerini bekliyoruz.

MİN EV XWEŞÎTÎ NAVÊ

Firat CEWERÎ

-Çi welatekî xweş e
Bi bêhn, hêşnayî û dar û gul.
Çi welatekî xweş e
Ev keç û xortên ser hev bi dil.

-Min ev xweşîtî navê,
Her roj birçî, bi çarox û dil bi kul.
Min ev xweşîtî navê,
Her roj bi lêdan, bê kar û bû şixul.

-Çi welatekî xweş e
Bê kanî, bi xuş-xuşa rezan e.
Çi welatekî xweş e
Gelên wê lê hêjan e.

-Min ev xweşîtî navê,
Tim bindar û tim reben.
Min ev xweşîtî navê,
Bê ziman bim ez her dem.

-Çi welatekî xweş e
Bi kendal, hem bi gir û berî ye.
Çi welatekî xweş e
Bi dewar, bi pez û bi kerî ye.

Min ev xweşîtî navê,
Bê mal û bê arvan bim.
Min ev xweşîtî navê,
Bê şîr û rûn û mast bim.

-Çi welatekî xweş e
Bi tirimpêl, bi texsî û kamyon e.
Çi welatekî xweş e
Bi petrol, bi fosfot û bi don e.

-Min ev xweşîtî navê,
Bê çira û lampe bim.
Min ev xweşîtî navê
Tim peya di riyan de bim.

-Çi welatekî xweş e
Bi gol û hem bi çem e.
Çi welatekî xweş e
Hem serma û hem germ e.

-Min ev xweşîtî navê,
Qirik ziwa û tim tî bim.
Min ev xweşîtî navê,
Li çolbeyaran bê cî bim.

-Çi welatekî xweş e
Bi nîsk û nok û genim e.
Çi welatekî xweş e
Li ser çiyan him him e.

-Min ev xweşîtî navê,
Bê firîk û şorbe bim.
Min ev xweşîtî navê,
Tim di derdê xwe de bim.

-Çi welatekî xweş e
Bi mamostan û dibistan.
Çi welatekî xweş e
Tev dotmam û tev pismam.

-Min ev xweşîtî navê
Bê makziman bixwînim.
Min ev xweşîtî navê,
Ger em tim li hev xînin.
Min ev xweşîtî navê!
Bes masta, bes bibêj!..
Min ev xweşîtî navê,
Ta ku ez nebim serkêş!

☆ ☆
☆

AZADÎ

M u s a

Azadî navekî şîrîn
Gutin heye, lê kirin nîn.
Ew peredeka stur û mêzin;
Li paş wê her xwe diveşêrin,
Zordest serdest û pêtêrîn.
Bindest, perîşan, pay nînin
Jidêvan, bes dibihîsin.
Lê na bînin, hem mal nînin,
Li ser zimanan jî bînin.
Serdest hev diguhezînin
Sîtem, jarî li cih dimînin
Perîşan jar xewnan dibînin

Ji zîndanek bo yêka dî
Ne çu zenge ji azadî.
Guherîna çuv û destan,
Ne domahîye ji bo êşan
Azadî ew jînek zelal
Pir xweşe hem zu jî delal
Maba we ye, gel bistînin.
Li rex wek hevîyê deynin.
Ew her du bo jînê yarin
Evînîyên wan pi dijwarin
Azadî wek hevî û jîn
Mirovîtî, bê wan qet nîn.

☆ ☆
☆

www.arsivakurdi.org

Belçika'da Skandal

Ortadoğu ülkelerinden İran, Irak, Suudî Arabistan'a avrupa'dan mal taşıyan 75 Türkiye'li şoför insan ticaretine kurban ediliyor.
Endişe verici 40 transport şoförü St. Niklas kasabasında OK TRANS şirketinin küçük odalarında yaşam kavgasi veriyorlar. Adı geçen şirket adına Belçika'dan kimyevi maddeler, parça ve aletler, inşaat malzemeleri ve Belçika mamullerini ortadoğu ülkelerine, her türlü sosyal güvence'den yoksun ve uluslararası trafiğe uygun olmıyan yollardan geçiyorlardı.
Adı geçen şirkette, sömürü ve insan ticareti nasıl oluyordu ?
OK TRANS'ın bir kolu, Türk olan bir komisyoncu vasıtasıyla Türkiye'den belli bir miktar para karşılığında şoför ve TIR'larını işe alıyorlardı. BENELUX ülkeleri için geçici vize alan bu şoförler alınterlerinden biriktirdikleri veya borç aldıkları paralarla Almanya veya Holanda'dan elden düşme TIR arabaları satın almışlardı. OK TRANS bundan bir yil önce biri Holanda'lı, KANT, diğeri bir Türk sömürü aği komisyoncusu olan ÖCMEN dir. Iki ve dört bin Florin karşılığı sahte formalitelerle şoförleri aldatıp şirketlerine kaydeden bu iki insan tüccarından Türk olan ÖCMEN, yerini Belçika'lı Eddy Vandenbroek' a devretmiştir. OK TRANS'a transfer edilen şoför ve araçları resmiyette Belçika arabaları sayılıp plaka alıyorlardı. Bu sahte faturalar sayesinde adı geçen şirket,kamyonlarahiç bir kuruş ödemeden sahip çıkıyor. Türkiye'li şoförler, OK TRANS'ın merkezi olan St. Niklas'a gelip hiç bir resmi evrak imzalamadan çalişmak zorunda idiler.
Belçika'da çalışma izinleri olmıyan şoförlerin geçici vize'den başka hiç bir şeyleri yoktu. Çünkü resmi adresleri ve patronları Türkiye'den, sigortalarda Türkiye'den yatirliyordu. Fakat bütün emirler, yük alma, yola çikma ve harcamalar Belçika'dan yapiliyordu. Bu uzun yollarda şoförlerden ikisi ölmüş, bir çoğuda 52 gün Iran'da tutuklu kalmıştır. OK TRANS tüm bu şoförler için St. Niklas'

taki merkezinde, hepsi için bir tek oda, bir banyo, bir salon, bir mutfak ve de bir tuvalet tahsis etmiştir. Çoğu şoförler oda'da yer olmadığından arabalarının içinde yatıyorlardı.
7-8 aydan beri ücretleri ödenmiyen ve sefere gönderilmiyen şoförlerin yüm ümitleri kaybolmuştu.
OK TRANS, şirketler arası rekabetin olduğundan iş olmadığını ve onlara başka iş bulacaklarını söyliyerek avutuyorlardı. Şoförler dil bilmediklerinden dolayı, Türkiye'li Işçiler Kültür Merkezi başkanı Hüseyin Çelik ile kontakt kurmuşlardır. Çelik ve Herman Verheirstraeten (devlet genel sekreteri, Sosyal işler eski bakanı müşaviri) şirket yetkilileri ile görüşmüşlerdir. OK TRANS Türk şoförlerinin vizelerinin bittiğini bildirmişti. Jandarma, yabancılar polisi, iş müfettişleri, gümrük yetkilileri, vergi memurları v.s. OK TRANS merkezine gelerek çok sayıda belgeye el koyarak ayın 14'ünde Belçika'yı terketmelerini söylediler. Çelik ve Herman'ın girişimiyle oturumları uzatıldı, her iki tarafın avukatları görüşmalere başlamışlardır. Türkiye'li şoförler, eski tüm alacaklarının ödenmesini ve kamyonların gerçek sahiplerine verilmesini ve de Belçika'da kalma iznini istiyorlar. Sosyal Asistan'dan yardım alan şoförlerin direnişi devam ediyor.
Têkoşer, şoförlere bir dayanışma yemeğini verek mücadelelerini desteklediğini ve destekliyeceğini belirtti.

BEN VE MAPUSLUĜUM

Medeni Ferho

.....
Ben
Memleketimi
yatıyorsam mapuslukta
Senin için
Yalnızca senin için
.....
Acının
Sonsuzun
Ve ölümsüzlüğün
Sevgideki gerçeği için
.....
Ben sevdamı
yatıyorsam mapuslukta
Memleketim için
Yalniz memleketim için.

JÎN

Derwêş Ferho

Roj weha bê şerm
Di ser vê axê ra
Zordestî û zorban ra
Bê deng dibihurê.

Jîna xweş
Ji me ra tarî ye
buha ye.
Li cihekî elem
dîn
namus
û şerm.
Li cihekî jîn
govend
û dîlan e.
Li cihekî derb li ser dil
kezeb
gurçik
û xeyal e.
Li cihekî dest li ser lingê
tiving
keleşînkof
û mawzerê ye.
Li cihekî hewar
nalîn
xwîn
û kîn e.
Li cihekî seyran
Leylan
û dêran e.
Cihê jîn lê xeddar e
ked e mezin
Riknê dinê ji wir ava dibe
Li cihê din jî dest danî ne
ser kedê
Qanun çêkirinê ku bixwin
Vê keda zelal.

Ta ku nestîne her kes
Mafê xwe
Û jîn xweş bike
Ti bûk nikarin dil
Bi delalê xwe ra şa bikin.

www.arsivakurdi.org

YEKBUYÎNÊ LI SER

Tu çiqas şîrînî Kurdistan, delala dila û hêjayî sebra dila. Kî dilnakevî te ko carekê te bibînî, çav li delalîya te bikî. Ne ji ber vê yekê ye di demê xwede siltan, şah, kral, xewê xwe li ser te direvandin. Îr ji komar xewê xwe li ser te direvênin. Daxwazîya berdestkirina te di pay perda dînde xef kirîne û me kêşandine alî xwe. Bi vî awayî ev çend sed sl heye ko bêhemdî gelê me, xwîna me yî zelal li rêya tede, ji bonî xwe dane rêjandin. Alîyê ko em lê her tim serdest, alîyê din her tim bindest bûye û dewran li serê wan gerîya ye. Me rojekê ji van roja, bi hevre qîr nedaye wana. Me negotîye gelî siltan, şah , kral û komarno, Ev kêferata we li serser çi ye. Hun li ser çi vê pevçûnê bi me didin kirin. Ax ya me, pevçûn ji me.Ya we çi ye. Di ka rawestin. Ko pevçûnik pêwistbî, em karin bikin. Ev ax ne ji sed salan, ji hezar salan û vêde ya me ye. Me çend dewlet ji bonî vê axê ji hola dîrokêtevlu ristê wan rakirî ye. Navê Kurda bi tenê li ser vê axê hatîye gotin.Bi tenê dengê dilê me, govendê me li serê van çîya li nav van naxal û mesîla tê bihîstin. Me ru nedaye DEqnenos (Îskender), xulagu Xan û Temirleng..Bê destûpê ji hola dîrokê tevlu gelê xwe rabûn. Em dîsa hene û jipêya ne. Deynekirina me ne ji qelsîya me ye. Pişta me ji rista me yî hozekî şikestî ye. Me carekê gotîye em eşîr in. Rista eşîrtîyê pêsîra me girtî ye. Hew der ji me diqerî. Me guhdaye pêşengên eşîrê xwe. Ew çi gotî, me bi ya wan kirî ye.Mîr, beg, axa û şêxême, qelûn û tîrêkê xwe pêxistine paldana balgihê mezela, zirt û wasifdanê xwe kirine di civatade. Berê eşîra dane hev, wan bi hev dane şikênandin. Di vê lebikandinêde, nehiştine ko em we bibînin. Ya di dilê wede têderxin.Di vê navîyêde we ya dilê xwe kirî ye.

Di dema dewleta me yî Merwanîde, pêşî Selçuqî, pişra Osmanî, tevlu pencsed konê xwe di axa Kurdistan, bi rêwingî buhûrtin. Pêşî Selçuqî, pişra Osmanî dewletê xwe danîn. Hino hino xwe gihandin axa Kurdistan. Li rojhilata Kurdistan dewleta Farisa hebû. Siltanê Osmanî û Şahê Farisa, têgiheştî giringîya cihê Kurdistan bûn. Her du dewlet, ji bonî berdestkirina Kurdistan çend caran şer kirine. Pêşî em wana darîçav bikin.

Şerê çardêran 1514 :

Bi arîkarina bist hezar Kurd, şer li axa Kurdistan, di nav siltanê Osmanî Selîmê yekemîn û Şah îsmaîl bû.Talîya şerde Şah Îsmaîl bindest ket. Osmanî dikevin axa Farisa. Dawîya şerde, ser qencîya Kurdara, Osmanî wa digirêdî bêşê. Ev bêşdan destpê ka bindestîya Kurd û Kurdistan e.

Peynama Amasya 1555 :

Di sala 1529 de Faris axa Kurdistan ko di şerê çardêrande dabûn Osmanîya, vegerandin bindestî xwe. heta sala 1555 a, di axà Kurdistande man. Ser vê yekê Osmanî û Faris dîsa li ser axa Kurdistan şer kirin.Siltanê Osmanî, Qanunî Siltan Silêman Farisa dîsa bindestkir. herdu dewlet talîya vî şerîde, peynama Amasya di nav hevde danîn. Li gora vê peymanê, axa ko bi şerê çardêran standibûn, dîsa vegerandin bindestî xwe.

Peynama Qesrîşîrîn 1639 :

Di sala 1623 de Faris kirin axa Kurdistan ko bi peynama Amasya dayî Osmanîya vegerênin bindestî xwe. Di vê salêde dîsa ketin axa Kurdistan. heta sala 1939 a, di axa Kurdistande man . Ser vê yekê Osmanî û Faris ser axa Kurdistan şer kirin. Siltanê Osmanî Miradê çaremîn axa Kurdistan bi peynama Qesraşîrîn ji Farisa dîsa sitand. Qesraşêrîn bajarekî Kurdistan e .

Peynama Emîr Eşref 1727 :

Di sala 1727 a, di dema Emîr Eşref û di sala 1747 de, di dema Nadirşah Faris kirin ko axa bi peynama Qesraşîrîn dabûn Osmanîya dîsa vegerênin bindestî xwe.Lê Osmanî pêşî bi peynama Emîr Eşref, pişra bi peynama Nadirşah axa Kurdistan vegerandî alî xwe kirin.

Peynama Erzurum i yekemîn : 1823

Ji peymana Nadirşah heta sala 1818 a li Kurdistan şer nebû. Di sala 1818 de Faris dîsa ketin axa Kurdistan. Osmanî dîsa wana şikênand. Bi peymana Erzurum î yekemînde Faris ji axa Kurdistan derketin. Kurdistan dîsa ket destê Osmanîya.

Peymana Erzurum î duyemîn : 1847

Cihê Kurdistan cihêkî stratejîk e. Ji ber vê yekê Faris û Osmanî ne divan ko wî cihî ji destê xwe derxin. Ji ber vê yekê Osmanî ketin Kurdistana destê Farisade. Heta çîyayê Zagros sitandin. Giringîya cihê Kurdistan darîçavê dewletê din jî bû. Ji ber vê yekê Ingîlîz û Rûs, destavêtin axa Kurdistan. Ne hiştin ku Osmanî û Faris şer bikin. Bi navcîtîya herdu dewleta kirin ko komcivênkê çêkin. Komcivîn sê sal domkir. Faris baskî komcivênê nedibû. Ser vê yekê hêza Necîp Paşayê Osmanî çû Kerbela ji Farisa sitand. Armanca wî Farisa rûnênî masa komcivênê. Ser sitandina Kerbela Faris hatin komcivênê. Di sala 1847, miha 5 min û roja 31 min de, di dema siltanê Osmanî Abdulmecît û şahê Farisa Şah Mihe-

www.arsivakurd.org

KURDİSTAN

medde peymana Erzurum î duyemîn hat danîn. Li gora vê peymanê bajarê Kurdistana başur Silêmanî gihaşt destê Osmanîya.
